Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 103

15'ê Çileya Paşîn a 2009

Buha: 150 Tûmen

agirî

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Pîrozahî

Hejmara 500 a rojnameya **KURDISTAN**, hate çap û weşandin. KURDISTAN temendirêjtirîn weşana Kurdî ye ku berdewam hatiye weşandin. Heta niha di sê qonaxan de hatiye çapkirin. Hejmara 1 a wê di serdemê Komara Kurdistanê de hatiye weşandin. Em pîrozbahiya xwe ya herî germ û gurr pêşkêşî xebatkar û rêveberên rojnameya KURDISTAN'ê dike û di kar û xebata wan de hêviya serkevtin û berdewamiyê dixwaze. **Desteya Weşana Agirî**

# KOMARA ÎSLAMÎ YA ÎRANÊ BİNC Û RÎŞALA ŞERÊ XEZEYÊ


**Vekirina TRT6'ê Gaveke Biçûk Ya Erênî**




2

**Şer Li Xeze û Şerûdiya Tehranê**



4

**Heval ! Eger Hûn Çûn, Min Cî Nehêlin!**




5

**Civak Nîviya Laşê Xwe Dişewitîne**



7

**ZANYARÎ**



9




Zêdetirî 20 rojan e ku Şerê navbera Hemas û Îsraîlê dest pê bûye û heta niha zêdetirî 900 kes hatine kuştin û çend hezar kes jî birîndar bûne.

Şer demekê dest pê bû ku hêzên Hemasê çend rojan bi roket û mûşekên Komara Îslamî êrîşî ser başûrê Îsraîlê kirin û Îsraîl jî li hember wan êrîşan bêdeng nesekinî.

Komara Îslamî a Îranê ji rêya piştgirî û hevkarî bi rêxistin û girûpên tundajo yên Rojhilata Navîn, berdewam şer, teror û fitneyan diafirîne. Piştî şerê sala borî yê Hizbulahê tevî Îsraîlê, vê carê jî bi afirandina şerê Hemas bi Îsraîlê re dixwaze hin armancên xwe ên gemar li herêmê bişopîne. Şîroveya berfireh li ser vê mijarê di rûpela 4 a vê hejmara Agirî de bixwînin...

## Duheftînameya "Rojhelat" Dîsan Hate Girtin




Duheftînameya Kurdî-Farsî ya "ROJHELAT" ku biryara ragirtina wê ji aliyê Dîwana Bilind a Welat ve hatibû hilweşandin û ji bervar 01.11.2008'an, dubare di deverên Kurdakincî de belav bibû, bo cara duyemîn ji aliyê Heyeta Çavdêr bi ser çapemeniyan ve hate girtin û derfetnameya wê hate hilweşandin.

Biryara hilweşandina moletnameya "ROJHELAT"ê, ji aliyê Elîriza Melekiyan, birêveberê Heyeta Çavdêr bi ser çapemeniyan, roja 11.01.2009'an, bi Ebdula Sohrabî, xwedî û berpirsê giştî yê wê belavokê re hate ragihandin.

Piştî hilweşana biryara berê ya ragirtina belavoka han, tenê 5 hejmar bi birêveberiya Mihemedelî Tofîqî, jê belav bibû.

Mihemedelî Tofîqî di vê derbarê de got: biryara ragirtina "ROJHELAT"ê, di demekê de hat ragihandin ku hejmara nû a vê di bin çapê de bû. Serbarê vê çendê ku manşeta hejmara berê ya belavoka han tekez li ser çareseriya pirsa Kurd bi rêya aştiyê weke baştirîn rêçare kiriye, lê mixabin berpirsên rejîmê, bi şaşîtî, rewşa deverê ber bi qedexekirin û sansora ragihandinê dibin.

Di hejmara nû a "ROJHELAT"ê de, hevpeyvînek tevî malbata Îbrahîm Lutfulahî(xwendekarê Kurd ê bajarê Sine ku di bin îşkenceya hêzên Ewlekariyê de jiyana xwe ji dest dabû), hatibû kirin, her weha raporek li ser sedemên paremayiya aborî li gor nêrîna aborînasan û berpirsên dewletî û sergotarek ji Dr. Ebdula Ebrîşemî hatibû nivîsîn ku derfeta çapkirinê jê re nehate dan.

# Vekirina TRT6'ê Gaveke Biçûk Ya Erênî

**N: Bahoz**

Nasyonalîzma berçavteng, faşîzm, rasîszm û nejadperestî hin îdeolojî ne ku berevajî pirraniya îdeolojiyên din, li ser bingeha hebûnnasî û gerdûnînasiyê nehatine avakirin, belku berhema bîr û ramana bertesk a komek mirovên nexwendewar û xeyalxaw in û tu pêwendiya wan bi felsefe û mirovnasiyê ve tune ye. Lewra îdeolojiyên wiha, renge di qonaxe û merheleyeke dîrokî de, bikaribin xelkê sade bo aliyê îdeolojiya hişk û req a xwe rabikişînin, lê bi vê sedemê ku belgeyên wan jar û lawaz in, gellek zû û bilez weke girê lîm ji nav diçin û bi tevahî ji holê radibin û tenê di nava rûpelên pirtûkên dîrokî de dimînin.

Dewleta nû a Turkiyê 80 sal e bi teorî û piratîk bangewazê ji bo yekdewlet, yekziman û yekalayê dike, lê di demekê de welatê Turkiyê, welateke pirrnetewe ye û ji bilî Kurd û Turkan, neteweyên Ermen, Çerkez, Ereb û hwd jî di wî welatî de dijîn û kiryar û piratîka siyasî a dewleta Turk bo ji holêrakirina nasnameya neteweyî û etnîkî a wan netewane gihîştiye dawiyê û meydana siyasî a welatê Turkiyê, bi bûyerên bi bandor û hejîner ve êş û janan digire.

Ji destpêka sala nû a 2009'an şûnde, dewleta Turkiyê vekirina kanala esmanî a TRT6'ê bi zimanê Kurdî ji aliyê Receb Teyib Erdoxan ve ragihand û berpirsiyarên AKP'ê ji vê yekê zêdetir çûne pêş û bas ji vekirina koleja ziman û wêjeya Kurdî li zanîngehên Stenbol û




Ankarayê jî dikin.

Dema mirov bala xwe dide siyaseta nejadperestane a dewleta Turkiyê li dijî neteweya Kurd li wî welatî, ew gava nû a dewletê paşekêşeyeke zihnî (sobjektîv) û bidawîhatina siyaseta regezperestane a wî welatî li dijî neteweya 25 milyonî a Kurd li Turkiyê tê hesibandin.

Em dikarin di van xalên jêr de, balê bikşînin ser sedemên paşdekişana dewleta Turkiyê der barê înkarkirina ziman û kultûra gelê bindest ê Kurd:

1. Xebata zêdetirî 80 salan a rewşenbîr, rojnamevan û partiyên siyasî yên Kurd û tekezkirin û biîsrarbûna wan li ser mafên rewa û berheq ên gelê Kurd. Lewra em bi xatircemî ve dikarin bibêjin ku xebata keç û xortên welatparêz ên gelê me li Bakûrê Kurdistanê, rola herî zêde di wê paşdekişiyan û gava erênî de heye ku AKP'ê derheq zimanê Kurdî de avêtiye.

2. AKP, partiyeke miyanerew û Îslamî ye û bona vê çendê ku li ser kursiya desthilatê bimîne, hewcehî bi dengê nifûsa 25 milyonî a Kurd li Bakûrê Kurdistanê heye.

Lewra heke li hember Kurdan bi nermî nelive û serederiyê neke, dengê Kurdan ji dest dide û di herêm û bajarên Kurdan de, karîn û şiyana berengarîkirin û rûbirûbûn tevî partiyên nejadperest yên Turk tu namîne.

3. Turkiye, welatek e ku li gor welatên din ên Rojhilata Navîn pêşketîtir e, çi di warê pîşesaziyê de û çi di warê sîstema siyasî û dezgeh û saziyên sivîl de. Lewra çendîn sal e ku hikûmeta Turkiyê dixwaze dakeve nava Yekîtiya Ewropayê, heta ji vê rêyê ve bikare komek destkevtên mezin û bihagiran ên siyasî û aborî ji xwe re misoger bike.

Ji aliyekî din ve, Turkiye agahdar e û dizane ku sîstema siyasî a wî welatî tevî standardên YE'ê natebah û nakok e û heta xwe bi wan norm û standardan re neguncîne, welatên endam ên Yekîtiya Ewropayê, wî welatî weke endamê YE'ê wernagirin.

Rohn û eşkere ye ku ew gava erênî ya hikûmeta Turkiyê derbarê zimanê Kurdî, bi gaveke biçûk û erênî tê hesibandin û tenê ew pêngave weke dabînbûn û pêkhatina hûremafeke kurdan di wî welatî de tê zanîn.

Ji ber ku, pirsa Kurd pirsa neteweyeke bindest e û di bingeh de pirs û dozeke siyasî – aborî ye û tenê û tenê xwe di pêkanîna hemû mafên Kurd de dibîne, ew jî tenê ji rêya diyarîkirina mafê çarenivîsê ve tê ewle û misogerkirin.

# PDKÎ: Me "YZOKÎ" Ava Nekiriye

Piştî damezirîna "Yekîtiya Zanayên Olî Yên Kurdistana Îranê" û belavbûna nûçeya wê di rojnameya "Kurdistan"ê de ku Organa Komîteya Navendî a PDKÎ diweşîne, hinek dezgehên ragihandinê yên ser bi Komara Îslamî a Îranê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê weke damezirênerê rêxistina han dane nasîn.

Her wiha hinek hêz û aliyên Opozîsyona Îranê ya seranserî û heta Kurdistanî jî, bê vê yekê ku lêkolînek li ser rêxistina han kiribin, hevdeng tevî rejîmê, "YZOKÎ"ê bi destkirda PDKÎ didin nasîn û PDKÎ xistine bin êrîşa rexneyan. Mixabin aliyên han yên Opozîsyonê, serbarê vê yekê ku xwe bi demokrat dizanin, her diyarde û tiştên ku ji bilî wan be, bi zêde dizanin û weke pîlana dujmin lê dinêrin.




PDKÎ her wekî berê jî ragihand, "YZOKÎ" bi rêxistineke serbixwe dizane ku ji aliyê hinek mamostayên Olî di hundirê Kurdistana Îranê de hatiye damezirandin û PDKÎ tu berpirsiyariyek derheq wê rêxistinê tune ye.

Sedema propagandeyên Komara Îslamî li dijî rêxistina "YZOKÎ"yê, tirsa rejîmê li wê rêxistinê ye. Rejîma Komara Îslamî a Îranê hewlê dide ku mamostayên olî ên Kurd ku bi dilxwazê rejîmê karê nakin, bixe jêr rikêfa xwe û gefê ji wan dike daku ji rêxistina "YZOKÎ"yê dûr kevin.

Kiryara han a rejîmê ji bo me ne cihê ecêbmayînê ye, ji ber ku karên wiha çewt û nerast beşek ji zatê rejîmê ye. Lê helwesta hinek ragihandinên Kurdî di vê derheqê de ecêb e ku renge bi nezanî lê bi kiryar, berevajî nîşandana rastiyên Kurdistanê û ji bo êrîş bo ser PDKÎ, bi Komara Îslamî re hatine xapandin û bi vî awayî jiyana mamostayên olî ên Kurd jî xistine xeter û tirsê.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Nûneratiya Derveyî Welat**
**Parîs - 07.01.2009**

www.arsivakurd.org

# Bûyerên Herî Girîng Yên Cîhanê Di Sala 2008'an De

Amadekar: Selîm Zencîrî

Sala 2008'an, bi hemû evraz û nişîv, xweşî û nexweşiyan ve derbas bû. Di vê salê de çendîn bûyer û guhertinên bingehîn di asta dever û cîhanê de pêk hatin. Di hin biyavan de bi taybet di warê aborî de, 2008 bi salek reş tê binavkirin. Emê li vir îşare bi bûyer û qewmînên herî giring ên sala borî (2008) bikin:

**Rapora lêjneya Vînograd ya taybet bi şerê Îsraîl û Hizbulaha Lubnanê**

Komîsyona Vînograd ku ji aliyê hikumeta Îsraîlê ve bo vekolîn li ser şerê Îsraîl û Lubnanê pêk hatibû, di 31'ê Çileya Paşîn de rapora xwe weşand û têda qala şikesta mezin a Îsraîlê di wî şerî de kiribû û rexneyek tund ji berpirsiyarên Îsraîlê girt ku stratejiyek jêhatî ji bo wî şerê nebûne.

**Kuştinek berpirsek payebilind yê Hizbulahê**

Bi sedema teqîna otombîleke bombebarkirî li bajarê Şamê, paytexta Sûriyê di roja 12'ê Şibata 2008'an de, Îmad Moxniye berpirsê leşkerî yê Hizbulaha Lubnanê hate kuştin. Hêjayî gotinê ye ku Îmad Moxniye berpirsiyarê encamdana çendîn kiryarên terorîstî bû.

**Kosovoyê serxwebûna xwe ragihand**

Piştî sê mehan gotûbêj û danûstan di navbera berpirsiyarên Amerîka û Yekîtiya Ewropayê û Rûsiyayê li ser pêgeha Kosovo, roja 17'ê Şibata 2008'an, Haşim Tacî serxwebûna Kosovoyê ragihand. Piştre Amerîka û gellek welatên cîhanê piştgirî ji vê serxwebûnê kirin. Hin welatên cîhanê weke Rûsiyê li dijî vê bityara Kosovoyê derketin.

**Berfirehbûna Rêxistina NATO**

Di 3'ê Nîsana 2008'an de, berpirsiyarên "NTO"yê, welatê Korwasya û Albanya weke endam di vê rêxistinê de qebûl kirin û bi vê çendê jî hejmara endamên NTOyê gihîşte 28 welatan. Amerîkayê jî gellek cehd û hewil da heya ku Gorcistan û Okraniyayê jî di vê rêxistinê de bihên wergirtin, lê bêencam ma.

**Pirsa Etomî ya Îranê**

Di Nîsana 2008'an de, Serok Komarê Îranê, Mehmûd Ehmedînejad ragihand ku Îranê di navenda Etomî ya Netenzê de dest bi danîna 6000 Santirfiyojan kiriye û bi xurtî li ser berdewambûna Komara Îslamî di programa navikî de tekez kir.

**Dîmîtrî Mîdvêdêf bû Serok Komarê Rûsyayê**

Di 7'ê Gulana 2008'an de, serokê nû yê Rûsiyayê dest bi kar bû û sonda qanûnî xwar, roja piştre jî Parlemana Rûsiyayê Potîn wekî Serok Wezîr destnîşan kir.

**Gotûbêj di navbera berpirsên Îsraîl û Sûriyayê de**

Berpirsiyarên Îsraîl û Sûriyê dest bi gotûbêjên ne rasterest di 21'ê Gulana 2008'an de kirin. Sûriye dixwaze ku bilindiyên Colanê ku ji sala 1967'ê vere di bin kontrola Îsraîlê de ye, bistîne. Îsraîl jî dixwaze Sûriyayê ji Komara Îslamî ya Îranê dûr bike û bi vê çendê jî ji bandor û karîgeriyên Komara Îslamî di deverê de kêm bike.

**Civînên şanda Amerîka bi Îranê re**

Di 19'ê Tîrmeha 2008'an de, Seîd Celîlî nûnerê Komara Îslamî bo pirsa Etomî tevî nûnerê Amerîka, Firansa, Birîtanya, Alman, Rûsiya û Çînê civiya. Vîlyam Bêrnz Cîgirê Wezîra Karê Dereve ya Amerîkayê ji bo kar û barên siyasî beşdarî wê civînê bû. Bi vê çendê eva yekem berpirsê îdareya Bûş bû ku tevî şanda Îranî bicive.

**Serok Komarê Lubnanê hate diyarîkirin**

Aqibet piştî dawîhatina şer û pevçûn û kirîza siyasî di Lubnanê de, di 25'ê Gulana 2008'an de, General Mîşêl Silêman wek Serok Komarê Lubnanê hate destnîşankirin.

**Pirsa AKP'ê di dadgeha destûrî ya Turkiyê de**

Piştî heyamek dirêj li ser pirsgirêkên navbera partiya desthilatdar li Turkiyê (AKP) û Dadgeha Destûrî a Turkiyê, dadgehê di 30'ê Tîrmehê de biryara danexistina vê partiyê ragihand. Biryara daxistinê pêwîstî bi 7 deng ji 11 dengan hebû, lê alîkariya diravî bo vê partiyê kêm kir.

**Radoran Karadzîç hate girtin**

Radoran Karadzîç, serokê Sirbiyan di 21'ê Tîrmeha 2008'an de hate girtin û rodestî Dadgeha Tawanên Navnetewî hat kirin.

**Xwenîşandana sedan hezar hevwelatiyên Kerkûkê li dijî madeya 24'ê**

Di 28'ê Tîrmeha 2008'an de bi sedan hezar hevwelatiyên Kerkûkê li dijî biryara Civata Nûnerên Îraqa Fedral (24) xwenîşandan lidar xistin. Piştre bi sedema kiryarek terorîstî bi sedan kes hatin birîndarkirin û kuştin. Hêjayî gotinê ye ku madeya han ji aliyê serokatiya komarê ve hat vetokirin.

**Asif Elî Zerdarî bû serokê Pakistanê**

Di 6' Îlona 2008'an de, Asif Elî Zerdarî Serokê Partiya Gel a Pakistanê karî ji koma 702 dengên Parlemanê, 481 dengan bidest bixe û bibe Serokê Pakistanê. Zerdarî berê bi buxtana gendeliyê bo midehê 11 salan hate zîndanîkirin. Piştî terora Bînezîr Boto bû serokê Partiyê. Wî soza jinavbirina binke û çekdarên Taliban û El Qaîdeyê di Pakistanê de da gelê Pakistanê.

**Dest ji kar berdana Serok Wezîrê Îsraîlê**

Serok Wezîrê Îsraîlê, Ehod Olmert di 21'ê Îlonê de rizamendî li ser biryara dest ji kar berdanê nîşan da. Piştî eşkerebûna desthebûna wî di çend meseleyên taybet bi gendeliyê de û ew biryar girt. Paşan Tizîpî Lîvînî'yê nekarî hikûmetê pêk bîne û daxwaza hilbijartinên pêşwext kir.

**Biryarnameya çaremîn ya Neteweyên Yekbûyî li dijî Îranê**

Welatên 5+1 di civîna xwe ya 28'ê Îlona 2008'an de, biryarnameya çaremîn li dijî Îranê li dor programên navikî yên wê rejîmê der kir. Berî wê jî sê biryarnameyên din Îran ceza kiribûn. Lê rayedarên Îranê hêj razî nebûne dev ji programa navikî a xwe berdin.

**Şerê li navbera hêzên Rûsya û Gorcistanê de li Osîsîtaya Başûr**

Roja 8'ê Abê bi êrîşa leşkerî a Gorcistanê bo ser Osîtiyaya Başûr bi fermî dest pê kir. Paşan Rşsiyayê jî dije êrîşek lezgîn bo ser Gorcistanê dest pê kir.

**Olempiyada cîhanî li Çînê dest pê kir**

Gera 29'mîn a lîstikên Olempiyadê li bajarê Pekîn a Çînê di 08.08.2008 dest pê kir.

10500 werzişvanan li 302 pêşbirkêyan û li çarçoveya 28 lîstikên werzişî de têda beşdarî kirin. 24'ê wê meha dawî pê hat.

**Bahoza Darayî cîhan hejand**

15'ê Îlonê bi bahoza darayî hat binavkirin. Di wê rojê de çaremîn banka mezin a cîhanê îflas bû û zirarên wê gihîşte 50 milyon dolaran. Bi vê çendê jî zirar û ziyanek bi sedan milyar dolarî ji aboriya Amerîkayê da. Paşan hemû sînor derbas kirin û hejar û belengaz hejartir kirin û bi raya karnasên aborî rewşa han heya 5 salên din jî dê berdewam bimîne. Bahoza han zêdetirî ji 1 milyar kesan birsî dike û vê yekê nirx û buhaya niftê ji 147 Dolar ve kir 31 Dolar. Serokê Amerîkayê li 3'ê Çiriya Pêşîn de 700 Milyar dolar ji bo projeya sîstema darayî wajo kir.

**Obama bi serokê nû yê Amerîkayê hat hilbijartin**

Di 5'ê Çiriya Paşîn de bo yekem car di dîroka Amerîkayê de reşpêstek bi regez Afrîqayî weke berbijarê Demokratan bi serokê nû yê Amerîkayê hate hilbijartin. Wî roja 4'ê Çiriya Paşîn serkevtinek mezin bi ser rikeberê xwe de bidest xist. Ew Çil û çaremîn serokê Amerîkayê ye. Qirar e di 20'ê vê mehê de bi fermî posta Serok Komariyê bigre dest.

**Erîşên terorîstî bo ser Hindistanê**

Roja 26'ê Çiriya Paşîn çend êrîşên terorîstî li bajaerê Bembeî li Hindistanê hatin encamdan û di encam de 195 kes hatin kuştin û 327 kesên din jî birîndar bûn. Girûpek çekdar di nav Pakistanê de bi encamder hat nasîn û ji wê demê ve pêwendiyên navbera Hind û Pakistanê aloz bûne û tirsa şerek mezin di navbera wan her du welatên xwedî çekên Etomî de heye.

**Peymannameya stratejîk di navbera Amerîka û Îraqê de hate pesendkirin**

Serencama piştî kêşe û nîqaşek zaf, Civata Nûnerên Îraqa Federal di 27'ê Çiriya Paşîn de peymannameya ewlekarî – stratejîk di navbera Amerîka û Îraqê de wajo kir.

**Solavêtin ji bo Bûş**

Serokê Amerîkayê li serdana xwe ya dawîn ji bo Îraqê li 14'ê Çileya Pêşîn di konfernaseke çapemeniyê de tevî Malikî li Bexdayê tencam da. Di wê konfernasê de nûçegihanê kanala El Bexdadiyê, Montezer Zubêdî her du kite solên xwe avêtin Bûş û bi vî awayî bêhurmetî pê kir. Ev kiryare bûye rojeva medyayên cîhanê.

**Şerê xezeyê pêvajoya Aştiya Rojhilata Navîn xiste qonaxek nû**

Di rojên dawîn yên sala 2008'an de, şerê Xezeyê dest pê kir. Di encama mûşekbaranên Hemasê de bo ser Îsraîlê, Îsralê di êrîşek tund de roja 27'ê Çiriya Pêşîn êrîş kire ser Xezeyê ku heya niha jî şer berdewam e. Komara Îslamî ya Îranê bi fîtika xwe Hemas tûj kir û bûye sebebê kuştina nêzî bi 1000 kes û birîndarbûna zêdeyî 4000 kesan. Komara Îslamî dixwaze bi vê çendê prosesa aştiya Rojhilata Navîn ser negre û welatên Erebî ji Îsraîlê dûr bike. Çunku welatên Erebî jî li di jî bernameya navikî ya rejîma Îranê û bihêzbûna Îranê di deverê de ne.

**Encam:**

Bi giştî sala 2008'an saleke xweş û aram nebû. Çendîn bûyerên bi jan di cîhanê û bi taybet di deverê de qewimîn ku wijdana mirovahiyê dihejîne. Li Îranê di bin siya rejîma Îranê de zulm û zordarî li ser neteweyên Îranê bi giştî û nemaze kurdan berdewam e. Girtin û zîndanîkirina rojnamevan çalakên sivîl, mafê mirovan, û rewşenbîran berdewam e. Îdam û bi taybet ya ciwanên bin 18 saliyê her didome. Xizanî, giranî, hejarî û nesaxiyên derûnî û yên weke Îdzê bengdarî û... civaka Îranê dagirtiye. Madeyên Bêhişker û hejmara bengdaran di Îranê de zêde bûye. Eziyet û azardana xelkê bi taybet kasibkarên kurd ên ser sînoran ji aliyên Îranê ve zêde bûye. Roj nine ku kasibkar ji aliyê wan hêzan ve nehê kuştin yan li ser mayînên çandî nekevin û nehên kuştin yan laşê xwe ji dest nedin. Zulm û zordariya li ser jinan berdewam e. Herwiha topbaranên her du hêzên dagirker (Îran û Turkiye) bo ser deverên ser sînorên Herêma Kurdistanê berdewam in. Di asta navneteweyî de jî destê Îranê li pirraniya tund û tûjiyan û piştevanîkirin ji girûpên terorîstî dom kiriye û ... Bi giştî zext û girapên navnetewî li ser rejîma Îranê di sala borî de zêde bûn û em hêvîdar in di sala 2009'an de jî bi merama guhartinek bingehîn di Îranê de berdewam bin.

**RONÎ**

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên ”Agirî” re



**Ebdullah Hicab**

# Şer Li Xeze û Şerûdiya Tehranê

Dîmenên bi êş û azar yên zarok û jin û mêrên sivîl û bê berevan yên Filistînî ku ji ber siyaseta berpirsane ya Hemasê dibin qurbaniyê êrîşa nû û dijwar ya Îsraîlê, wijdana mirovatiyê diêşîne. Berdewamnekirina agirbesa ku di 6 mehên berî destpêkirina şerê dawî de, bi navbijîvaniya Misrê pêk hatibû, zemîneya şerê nû amade kir. Dema Hemasê çend roketên bê kêr yên bi alîkarî û teknolojiya Komara Îslamî ya Îranê bidest xistine ji Xezeyê re avêtin nav axa Îsraîlê, êdî çexmaxê şerê nû vêket. Kêşeya navbera Îsraîl û Filistîn ji roja ragehandina serxwebûna Îsraîlê ji sala 1948ê ve bi qonaxên pirr krîtîk û bi azar re derbas bûye.

Lê tundûtûjiya wê dawiyê di demekê de ye ku civaka Filistîn di hundirê xwe de netifaq e û beşek ji desthilatdariya Filistînê bi îmkan û navtêdana dereke, xelkê medenî kiriye bervank ji bo pêşvebirina siyasetên xwe.

Dema ku ji bo destpêkirina şerê nû hatibû danîn, diyare bi zanebûn û li gor hin hisaban hatiye kifşkirin.

Ev Şer di demekê de dest pê kir ku çavên cîhanê li siyaseta birêveberiya nû ya Amerîka di derheqa Rojhilata Navîn de ye. Lê berî ku Obama bi fermî derbasî Koşka Sipî bibe, Hemasê bi navtêdana Îranê şer da destpêkirin heta bikaribe hem li ser raya giştî ya cîhanê û hem jî li ser siyaseta nû ya Rojhilata Navîn ya Amerîkayê bandorê danê.

Ji aliyê din ve Îsraîlê jî ew derfet bi baş zanî heta bi riya zerbelêdan li Hemasê, hem serdestiya xwe di pêwendiyên pêşerojê de bi aliyê Filistînî re misoger bike û hem di siyaseta hundirê Îsraîlê de baweriya xelkê ji bo partiyên xwedî bandor ku ber bi kêmbûnê ve diçû, dubare vejîne. Lê di vê navberê de tiliya Komara Îslamî û karîgeriya wê li ser vêxistina agirê şer pirr xuya bû.

Rêxistina Hemas ji dema damezirandina xwe ve li sala 1987’an, heta sala serketina di hilbijartinên Filistînê de, bandorek giring li ser pêwendî û nakokî yên di navbera Filistînî û Îsraîlê de tune bû.

Lê ji sala 2006’a pê ve bû aliyê sereke di vê mijarê de. Bingeha civakî û siyasî ya Hemasê jî ji wê demê ve di nava xelkê Filistînê de hê xurt bû.

Rêxistina Hemas bi alîkariya perê ku ji dewlet û rêxistinên xwediyê îdeolojiya hevbeş distîne û ji rêya xizmetguzariyên civakî yên mîna avakirina xwendingeh, baxçê zarokan, malên kal û nivîşkanan û destgirtina kesên destteng, bûye rêxistina herî bi bandor ya Filistînî. Bi awayekê ku hema di demek kin de piştî serketina di hilbijartinan de hewl da kontrola hemû Filistînê bi dest bixe û tevgera Feth û birêveber ya Mehmûd Ebbas ji meydanê der bixe.

Havîna 2007’an, Hemasê tevgera Feth û birêveberiya Ebbas ji Xeze avête derve. Bi xurtbûna nakokî û dijheviya hundir ya rêxistinên Filistînî, pêvajoya gotûbêjên bi Îsraîlê re jî kete rewşek nû de.

Hemasê bi gef û tehdîda roketbarankirina Îsraîlê û avêtina hin roketan, di piratîkê de Mehmûd Ebbas û aliyên aştîxwaz yên Filistînî bi dijwariyan re rûbirû kir.

Bi vî awayî hêcet kete destê grûpên tundrev ji her du aliyan, hem Cihûyên tundajo û hem Bislimanên tundajo, ku hema ji destpêkê re li hember pêvajoya aştiyê bûn, ku agirê şer û netifaqiyê dubare vegeşînin.

Her du aliyan dubare dîfa xwe kutan pêvajoya aştiyê û bi awayek vekirî li hember wê pêvajoyê de şer dane destpêkirin.Bi şerê wê dawiyê, Hemasê xwest hem li hember reqîbên (rikber) xwe yên Filistînî, weke Tevgera Rizgariya Filistîn (bi taybet Feth) û hem li hember Îsraîlê de wek nûnerê xelkê Filistînê xwe nîşan bide.

Ji ber dengvedana karîgeriya şer li ser xelkê medenî û zêdebûna qurbaniyên sivîl, rengê hindê dide ku Hemas pêngavekê ji wê armanca xwe nêzîk bibe.

Ji bo partiyên sereke yên Îsraîlê jî ew şer bû derfetek heta karîgeriyê danên ser raya giştî ya welat û di hilbijartina li pêşiyê destkevtên siyasî bi dest bixin. Her 3 partiyên xwedî bandor ji wê demê ve ku gotubêjên navbera Îsraîl – Filistîn bi lihevhatina Osloyê (1993) dest pêkirî di desthilatê de bûne, lê tu yek ji wan encamek erênî ji wê pêvajoyê der nexistiye. Di hilbijartina îsal de rojeva hilbijêrên Îsraîlî ew e ka gelo dê kî bikare encamekê ji pêvajoya aştiyê derbixe û belaya roketên Hemasê ji serê wan dûr bixe. Partiya KADIMA û berendama wê ya serokwezîriyê “Tzipi Livni”, dewletek serbixwe ya Filistînî dipejirînin, lê bi mercekê ku ew dewlet bê îqtidara serbazî be.

Di wan salên desthilatê de, KADIMA nekarî bide selimandin ku li hember xeter û tehlîkeya Hemas û Hizbullah û grûpên tundajo yên din de siyasetek serkevtî dimeşîne.

Ehud Barak, ji Partiya Karker a Îsraîl alîgirê berdewamiya pêvajoya Oslo ye, lê ji ber ku heya niha tu encam ji wê pêvajoyê derneketine, gumana hindê hebû ku baweriya xelkê Îsaîlê di hilbijartina tê de bi dest nexe. Di wê navberê de aliyê herî tundajo, lê xwedî bandor, partiya rastgir ya LIKUD ya di bin serokatiya Binyamin Netanyahu de li bendê ye ku di hilbijartinan de pêgeha xwe xurttir bike. Lêxistina zerebên serazî yên xurt ji tevgera Hemas an her aliyek din yê Filistînî dê bi awayek rasterast karîgeriyê danê ser encama hilbijartinên pêşerojê yên Îsraîlê.

Lê ji Hemas û Îsraîlê bileztir ji bo şerê wê dawiyê, Komara Îslamî ya Îranê bû. Îran bi salan e bi duruşmên tundûtûj û pirr ji dijminkarî, raya giştî û alîgirên tundajo yên xwe li hember Îsraîlê de tûj dike. Her çend wekheviyek îdeolojîk ya xurt di navbera baweriya dînî ya Hemasê û ya Komara Îslamî de tune be jî, lê ji ber hevpeymaniya bi Hizbullah û eniya tundajo ya herêmê re, Îran weke alîgir û dostê Hemasê tê hesibandin. Ji ber rewşa aloz ya doza Filistînê bandora Îranê di nava Filistîniyan de çê bûye û Komara Îslamî wê bandorê ji bo pêşvebirina siyaseta xwe bi kar tîne.

Dijkiriyara Komara Îslamî li hember şerê dawî, dubare rola têkder û şofar a vê rejîmê derxiste holê. Komara Îslamî li ciyê ku ji rêyek çareseriyê bigere, alîkariyek mirovdostane bigehîne xelkê di nava şer de, an ji bo bi dawî anîna şer pêngavekê rake, di serî de nûnerên xwe weke Elî Larîcanî, Seîd Celîlî û hin Pasdarên din şandin cem alî û rêxistinên şerxwaz û alozîsaz ên mîna Hizbullah, Cîhada Îslamî, dewleta Sûriye, Sûdan, Venezuela û hwd.

Ji bo Îranê giring e ku rast di wê demê de ku pirsgirêkên wê yên hundir û bernameya wê ya çekên navikî di rojeva cîhanê de bû, karekî bike ku bala raya giştî ber bi ciyek din ve here. Bi vî awayî hem zexta li ser xwe kêm dike û hem meşrûiyetek cîhanî ji karên xwe û siyaseta xwe re bi dest dixe.

Îran li Filistînê li pey çend armancan digere. Ji aliyekê ve dixwaze hevpeymanan ji pirojeya “avakirina kembera kesk ya şîe” re peyda bike. Mebesta Îranê ji wê pirojeyê ew e ku ji Efxanistanê heya Lubnanê, bi riya civakên şîe re desthilatdariyek ji xwe re û hevpeymanên xwe re ava bike ku li ser heman hîmê îdeolojîk hatibe avakirin û Wilayetê Feqîh û dijberiya bi Amerîka û demokrasiya lîberal ji xwe re bingeh bigre. Ji aliyê din ve Îran hewl dide ku gotina dawîn di mijara Filistînê de ji rikeberên xwe yên Ereb bistîne û bibe hêza herêmî ya herî xwedî bandor.

Di warê siyaseta navxwe de jî Îranê hema niha pêwîstî bi sazkirina aloziyê li herêmek derveyî sînorên xwe hebû.

Di wê navê de kesên dibin qurbaniyê siyaseta Komara Îslamî, bêmesûliyetiya Hemasê û êrîşên Îsraîlê, xelkê bê berevan yê Filistînê ne.

Ji bo bi dawî anîna wê rewşê, çare ew e ku rê ji wê siyasetê re neyê dan ku li ser bingeha dijminkarî, hevûdin înkarkirin û îdeolojiya tundajo hatiye avakirin. Ew jî bi sê mercan ve girêdayî ye: avabûna dewleta serbixwe ya Filistîn, parastina ewlekariya Îsraîlê û qutkirina destên çapel yên Komara Îslamî.

www.arsivakurd.org

# Gelî Hevalan ! Eger Hûn Çûn, Min Cî Nehêlin!

**Beşa 1**



**Silêman Keleşî**

Eva gotina hevalên me yên birîndar bûn dema ku me ji bo parastin û dermankirinê datînane cihekê. Ev gotina her di hizr û bîra min de maye û heta mirinê jî dê her bimîne. Ev yeka bû sebeb ku ez wî navî ji bo vê nivîsarê hilbijêrim.

Gava Pêşmergeyek 17 salan di çeper û meydana berxwedan û xebatê de bibe û li dijî hikumetên hov û dîktator şer kiribe, di gotareke wiha kurt de nikare bas li hemû wan şer û berxwedanan bike ku bi xwe tê de beşdar bûye. Armanca min ev e ku li vira kuncekî piçûk ji berxwedana Pêşmergeyên egîd û çeleng ên **Hêza Agirî** li devera Bakûra Kurdistana Îranê, di herêma Soma'yê û li gundê **Ceter**'ê, ku bi **şerê Ceterê** hatiye binavkirin, bixim ber çavê we xwendevanên hêja.

Gava navê **Ceter**ê tê gotin, bo hemû wan kesan ku di vî şerî de beşdar bûne yan jî destana mêrxasên demokrat di wî şerî de guhdarî kirine, naveke bi wate û giran e. Bo min jî zindîkirina hemû van dîmenan e ku qet nayên jibîrkirin.

Zivistana sala 1363'an ya Rojî (1984) de, em wek Kadro û Pêşmergeyên hêzên: **Şehîd Sergurd Ebbasî** û **Şehîd Hatem** tevî beşkek ji hêza **Şehîd Niho** û desteyek jî ji hêza **Şehîd Aware** ku ji bo kar û erkên hizbî hatibûne Bakûra Kurdistana Îranê, li herêmên Soma, Biradost, Enzel, Kinarberoj, Geliyê Sûlê û deverên din yên Şimala Kurdistana Îranê di ger û çalakiya siyasî û leşkerî de bûn.

Zistan bû. Çiya û baniyên herêmê bi kirasê sipî yê berfê xwe xemilandibûn. Di wê xwezaya sipî de tenê hindek gund li dûr ve reş xuya dikirin. Ji ber hebûna dûnan (ew cihê ku di zivistanê de giya jê didin pez), lodên giya yên debarê û paqijkirina banê malan ji aliyê gundiyan ve. Hindek caran jî bi bihîstina verîna seyan (hefte hefta se), dîtina dûkela sobe û tendûran ku li kulekên xaniyan re dihate derê û wek mijeke piçûk li hindav serê gundan diyar dibû, mirov dizanî ku evane xanî û avahî ne (gund in).

Ser êvaran ku dinya hêdî hêdê sar û tarî dibû, xelkê sobeyên daran (koçan) di odên xwe de hil dikirin ku xwe li sir û seqema zivistanê biparêzin. Şevê jî bi kombûna li dora hev û bi gotina çîrok û qisên xweş, şevên xwe yên dirêj ên zivistanê kurt dikirin.

Hewayê deverê pirr sar e. Dikarim bêjim hewa şevan heta 20 dereca bin sifrê dadikeve. Rojên 9 û 10'ê heyva Befrabarê (Çileya Paşîn) hêz û qaweta Kadr û Pêşmergan kete navçeya Soma'yê ku hevsînor e tevî Kurdistana Bakur. Hêjayî gotinê ye ku navça Soma'yê li gundê Gunbedê bigre heta navça Şipîranê ye û tevî herêmên Biradost, Kinarberoj, Enzel, Şipîran, Geliyê Sûlê û deverên ser bi bajarê Gever a Kurdistana Bakûr cîran e. Herêmeke çiyayî e û berfa ser çiyayên bilind û bê dar yên vê heta heyameke direng piştî hewa gerimbûna hewa, her dimîne. Sarbûna hewa bûye sebeb ku di wê herêmê de bax û rez gellek kêm in.

Em wek hêzeke mezin li Soma'yê di gundên Berbinî'yê de digeriyan û qaweta me li gundekî diçûn bo gundekî din, refa me mîna werîsan dirêj dibû. Pirr caran tenê hevalên beled (Pêşmerge yan Kadr) û berpirs dizanîn ku emê bo çi ciyekê bimeşin. Ew hevalên me ku dibûne beled, tenê karê van rênîşandan bû ji bo gehandina me bi ciyê dyrarîkirî û ji armanca meşa me bê xeber bûn, tenê hevalên berpirs bûn ku dizanîn hedefa meşê çi ye.

Ji ber ku sir û seqemê herêm dagirtibû, hemû Kadr û Pêşmergan bi cil û bergên germ ên zistanê û gore û saqan xwe pêçabûn û li ser van de jî çek û rext avêtibûn ser milên xwe. Heta em ji gundekê diçûn bo gundekî din, ji ber sir û seqemê, ser û simbêlên Pêşmergan di bûz û xûsava mijê de sipî dibûn.

Divêt ez vê yekê jî bibêjim ku wê demê di nava şorişgeran de simbêl mod bûn, simbêl mîna niha bê qedir û qîmet nebûn.

Simbêl wek milaka şorişgerbûnê dihate hesibandin. Ji ber vê yekê hindek kesan heta pişkek ji rêdîna xwe jî dikirne simbêl. Kesên bê simbêl bi 'devrût' dihatin binavkirin û ji wan kesan re digorin '**dev rût**'. Yên wek me hingê devrût bûn. Lê pişka herî zaf ya kar devrûtan dikir û hemû li ser navê xwedî simbêlmezinan xilas dibû. Xelkê jî bi germî pêşewazî ji simbêlmezanin dikirin û destê xwe didane wan û ji wan re digotin '**te re gotî Pêşmerge, ez qurbana wan simbêlê te bim Pêşmergê Kurdistanê**'.

Gellek caran jî digotin ku ew devrûtane nikarin çi bikin.

Kadr û Pêşmergeyan bi rastî mandîbûn nedinasîn. Hindek caran barê van 15 heta 20 kîlo qurs bû, lê belê her bi wî barî hindek şevan 8 heta 10 demjimêran li ser çiya û baniyên Kurdistanê rê diçûn.

Her gav ku tiştek jî biqewimiya, mirov digot evane qet rê nehatine û mandî nebûne. Ji ber ku wan mirovan bi bîr û bawereke mezin rêya xebat ji bo azadî û rizgariya gelê xwe yê bindest û zilimlêkirî hilbijartibûn. Wan baş dizanîn ku ji bo çi û li ber çi bêwestiyan xebatê dikin û ew rê û rêbaz bi zanîn û agahiyek bilind hilbijartibûn. Ew zanîn û sehkirin bi zilm û zora dijmin dibû sedemê wê yekê ku xweragir û qahîm li hember givaşan û qehra xwezayê de bisekinin û qehreman û cangorî û pehlewanên gelê xwe bin li dijî zilm û zordariya dagirkerên Kurdistanê.

Eger rojekê jî Pêşmergeyan seh bi mandîbûnê bikirana, yan jî xem û nerihetiyek ji wan re bihata pêş, lêbelê gava diçûne nava xelkê û tevî pêşewaziya gem û gurr ya xelkê rûbirû dibûn, û didîtin gel wan weke keç û kurên xwe dihesibîne û xelk bi dilekî şewitî û bi germî wan hembêz dikin, bi her awayekî mumkin wan li hember gef û êrîşên dijmin diparêzin, û hemû tiştên xwe yên baş datînin di xizmeta wan de û dibêjin ku '**şert hûn in û hemû tişt bimbarek be ji bo we**' yan '**eger hûn nebin, em bo çi ne**!', bi bihîstina van gotin û pevan mandîbûn û xem û nerihetî ji bîr diçû û hêz û qawet ji bo xebatê li caran zaf û zêdetir dibû. Xwedîderketin û parastina Pêşmergeyan ji aliyê xelkê ve di wextên teng û dijwar de, dibû sedemê wê yekê ku Pêşmerge bi dilekî şewitî û pirr kul û kovan, qurs û qahîm û bêwestiyan ji bo serbestî û rizgariya gel cehd û xebatê bikin.

Belê, em gund bi gund digeriyan û her kes karê xwe dikir. Li her gundekê ku em diçûnê, Kadroyan civîn lidardixistin û li ser pirsên cur bi cur ji bo xelkê diaxivîn. Heke nerihetiyek yan astengî û dilmayînek di nava xelkê gundan de heba, ji bo van çareser dikirin. Ji ber xweştevîtî û ezîzbûna Kadr û Pêşmergeyan li cem xelkê, wan bi hêsanî dikarîn astengiyên di nava gel de safî bikin, ji hole rakin. Ev yeka dide xuyakirin ku şervanên azadiyê li çareserkirina pirsgrêkên civakî jî xafil û bêhay nediman û yekgirtîbûna xelkê jî bandorên mezin li ser bizavê hebûn.

Kadrên rêxistinî karên xwe dikirin û fermanderên leşkerî ji di fikr û hizra bername û pilanên xwe de bûn.

Ew Kadr û Pêşmergeyên ku xelkê deverê bûn, seh dikirin, wisa dizanîn ku meşa wan ji bo çi aliyekê diçe û li kura nêzîk dibin. Kesên ku xelkê deverê jî nebûn, li hevalên xwe dipirsîn ka gelo em bo kîderê diçin? û hindek caran jî ji hevalên şareza navê gundan dipirsîn. Hemû heval ji vê yekê arxayîn bûn ku pilanek heye ku ew hemû hêza komî ser hev bûye, lê nedizanîn ku ew pilan çi ye…

Gava mirov mêzeyî çav û rûmetê wan dikir, di çavên her yek ji wan de hezar pirs dihatne xwendin.

Hêza 'Sergurd Ebasî' ji 2 Likan pêk dihat û ez wê demê cîgirê Fermanderê yek ji wan Likan bûm. Ji ber ku Serlikê me di wê meşê de tevî me nebû, kar û barên Likê min cîbicî dikir. Ji ber vê hindê ez haydarê gellek tiştan bûm. Ez wê jî bibêjim ku devera Soma'yê ciyê kar û xebata hêza Sergurd Ebbasî bû.

Hêzên din ku hatibûne Soma'yê, mêvanên me bûn. Lê meydan û ciyê operasiyonê li navçeya xebata hêza Hatem bû. Hêza Niho û desta hêza Aware li deverê beled nebûn û belke jî cara yekan bû ew dever didîtin. Her kes keyfxweş û bi heyecan bû û kurdistanê zivistanê li me dirêj bibûn. Roj ji me re gellek hêdî derbas dibûn, ji ber ku her kes li hêviyê vê yekê ye ka kengê û çawan dê kar bê kirin.

Hindî em li hedefê nêzîk dibin, Fermander,

Kadr û beledên rêyan (Kadr yan Pêşmergeyên şareza li deverê) zêdetir pistepist û civînan dikin. Em wan gundan in Gêçê, Bawanê û Berdereş bicî bûn.

Di bervara 12.10.1363ê (1984) hêzên me çûne gundê Bêçecûk, Sakan û Mîrava'yê û roja dû wê re jî çûne gundên Ceter, Îngîce û Rikavayê. Navbera van gundên han bo çûn û hatinê kêmtirî nîv demhijmêr (30 deqîqe) e. Şeva 03.10.1984, em çûne gundê Beresipiyan, gundê herî dawî ku me bi roj dikarî bi eşkere hernê de û li Geliyê Sûlê hilkevtiye û nêzîkê li gundên ku niştecihên wan Azerî ziman in.

Hêza me bi giştî li Beresipiyan cî girt û bo berçavgirtina warê parastinî û haydarnebûna dijmin li ciyê hêza me, biryar hate dan ku nehêlin kes li gund here derê.

Diyar bû ku hereketa vê carê tevî carên pêşîn ferq hebû. Îdî mirov dizanî ku em li armancê nêzîk bûne. Hemû hêzên me yên navbirî gihîştibûn gundê Beresipiyan û civîn û amadekarî zêde bibûn.

Piştî demekê ku em di nava malên gund de bicî bibûn, em hatin haydarkirin ku ji bo civînê herin bo Mizgefta gund. Hemû dilnigeranî, pistepist, heyecan û pirs gehîşte dema dawiyê. Hemû heval rûxweş û devliken ji hevûdu re mêze dikin, lê hêşta kes naaxive û li benda hevalan bûn ku hemû kom bibin. Piştî hatina hemû hevalan û danîna hindek hevalan bo zêrevanî û qerewiliyê li derdora gund û ciyê civînê, hemû tiştek amade bû. Tenê mabû ku hevalekî berpirs rabe ser pêyan û wan hemû çavnihêrî û heyecanan bi gotin û baskirina pilan û armanca wê meşê bişkêne û hemû hevalan haydar bike. Hêjayî gotinê ye ku hingê 'Şimala Kurdistanê' hemû wek yek organê dihate hesibandin û kek **Muhenis Cihangîr Îsmaîlzade** berpirsê wê bû ku di wê meşê de bi me re nebû. Lê mixabin baş li bîra min nemaye ka kîjan hevalê berpirs bû ku rabû ser pêya û rêza bername û pilanê ji bo Kadr û Pêşmergeyan şirove kir, lê eger ez şaş nebim, kek **Cefer Hamidî** bû. Ew hevalên berpirs ku tevî me bûn heta ew ciyê ku li bîra min mabin, Şehîd **Elî Kaşifpûr**, kak **Cefer Hamidî**, Şehîd **Mela Xalid Baqî** (Fermanderê hêza Sergurd Ebbasî), Şehîd **Hesen Bazûke** (Fermanderê hêza Hatem), Şehîd **Birahîm Şêxalî** (Fermanderê hêza Niho), **Haşim Îbrahîmzade** (cihgirê Fermanderê hêza Sergurd Ebbasî), **Rehîm Salihzade** û gellek Kadr û berpirsên din ku bi rastî navê wan di bîra min de nemane yan jî li ber hindek sedemên xasmanî nayêne gotin. Daxwaza lêborînê ji van kesan dikim ku mixabin navê wan nehatiye anîn.

Gundê Beresipiyan ku dikeve geliyê Sûlê, ji rêya tiranzîtî ya Urmiye – Tehranê nêzîk e û li bajarê Selmasê (Dîlemanê) jî gellek dûr nine. Her wek hate gotin, hevalê berpirs di demekê de ku çend nivîsek girtibûn destê xwe, rabû ser pêyan û got: "Gelî hevalan! bernameyeke emelyatî (operasiyonî, leşkerî) heye ku divê îşev bê kirin.

Hemû tiştek pêşwext hatibûn hazir û berhevkirin. Pilan û nexşe hatibûn darêtin, deste û taqim bo ciyê hewce hatibûn diyarîkirin. Tenê hewce bû ku her hevalek bizane tevî kîjan deste û girûpekê ye ku ew jî berê ji aliyê Fermanderên eskerî hatibûn kifş û eşkerekirin û hevalê berpirs nav xwendin ku her kes tîma xwe nas bike û bizane digel kî ye û erkên wî çi ne û divê çi bike. Em bi ser 4 desteyan de hatibûn parvekirin û her desteyekê jî ciyê kar û erk û wezîfeyên van li hev cuda bûn. Piştî kutabûna axavtina hevalê berpirs, diviya ev tîm û deste li hev cuda bibana.

Ji bo hemû hevalên Kadr û Pêşmerge dema parvekirina kar ji bo şer û operasiyonan pirr heyecan hebû. Ji ber ku her kes bizane ka dê di kîjan destê de be û tevî kîjan hevalan e. Pirr caran parvekirina kar dibû sedema nerazîbûna hinek hevalan û hinek ji wan dixwestin ku ciyê van tevî kesekê ji desteyek din bê guhartin. Ji ber ku hogiriya hindek hevalan tevî hev hind bilind bû ku nedixwestin heta mirinê ji hev cuda bibin, veqetin.

Lê ev daxwaziya wan pirr caran ji aliyê Fermanderan ve nedihate pejirandin. Ji ber ku Fermanderan baş dizanîn ku kîjan heval bo çi şolekê baş e. Ji bo min jî her wek hevalan, çi wê dema ku Pêşmerge bûm û çi dema ku Fermander bûm, nexweştirîn dem, ev wext bû ku ji bo şeran dabeşkirina kar dihate kirin.

Dema ji hevdu cudabûn û maçkirin û xatirxwastinê bû, ji hemû wan hevalan ku rengbe careke din mecala hevdu dîtinê çi nebe, dibe ewa cara dawî be ku bikarin hevûdu bibînin û hembêz bikin, yan jî bi soz û qewlê ku dibêjin, dîtina me bikeve dinyaya piştî mirinê.

Di şer de diyar nine ka dê kê Şehîd be. Pirr caran heval wisa çûne û qet nezivirîne yan jî bê can û bê ziman zivirîne. Ew tişta di jiyana me de dubare û çendbare bibû. Lê gava mirov bi bîr û bawer xebata welatparêzî kiriba, wezîfa herî girîng, ka çawa mirov dê bikare awayekî baş welat û gelê xwe xilas û rizgar bike. Wextê ku Kadr û Pêşmergan bindestiya welat û gelê xwe didîtin ku di bin zilm û zordariyê de dinalîne û ji aliyê din pêşewaziya gel didîtin ku digotin hûn parêzvanên şeref û namûsa me ne, îdî gorîkirina canê xwe û hevalan bo serbestî û xilasiya Kurdistanê, axa bab û kalan, ku ji hemû kesî ezîztir e, dibû sedemê vê çendê ku mirov hemû nerihetî û destezîztirîn dost û hevalan tab û tehemûl bike.

Bi gotina Yilmaz Guney ku dibêje: "Em wan nerihetiyên piçûk!! qebûl dikin ku nerihetiya mezin derman bikin".

**Daxwazê dikim her kes têdîtin, rexne û pêşniyar li ser vê beşa nivîsînê hebe, dikare bi vê Emaila jêr pêwendiyê bike**:

**urmiye22@yahoo.com**

## Şiroveya Peyvên Siyasî



**Berhevkar:**
**Omîd Esxeran**
**omid_anbi@yahoo.com**

# Piloralîzm

Em dikarin piloralîzmê weke hikûmeta hevalbendî yan jî çend alîbûnê pênase bikin. Hizra han girîngiyek zaf û bêsînor dide zafbûna têkilekên xwezayî ên civakî. Piloralîzm di siyasetê de jî bi wateya bawerî bi çend alîbûn û serxwebûna girûpên siyasî, çandî û civakî di nav sîstemê de.

Her wiha hizra han alîgiriyê ji bihayên exlaqî û hewcehiya hebûna girûpên cur bi cur ên siyasî, civakî û aborî di nav sîstemê de dike.

Piloralîzm felsefeyek e ku dibêje: "Takekes nabe tenê balê bide ser rêbaza siyasî a dewletê û her vê rêyê ji xwe re hilbijêre, belku divêt balê bide ser hez û xweziyên din jî. Her wiha desthilata dewletê nabe were pawankirin". Lewra piloralîzm girîngiyê ji wan dewletan re dide ku bawerî bi zafbûn û serxwebûna partî û girûpên siyasî, kultûrî, civakî û olî hene û rêz û hurmetê ji mafên girûp û organên civakî ên weke malbat, ol, sendîka û hikûmetên herêmî digirin.

Piloralîzm li ser vê baweriyê ye ku ji bo diyarîkirina siyaset û rêzaba civak û dewletê, hewce ye hemû pêwendiyên aborî û olî werin liberçavgirtin.

Li gor ramana han divêt desthilata hikûmetî di civakê de di nava girûpên cur bi cur de were dabeşkirin, çunku girîngiya deste û girûpên han bi qasî girîngiya dewletê bixwe ye û renge hin caran jî emegdarî û dilsoziya girûpên han di civakê de, ji dewletê jî zêdetir be.

Di nava fîlesofên berê de, Sîsron(sedsala yekem a Zayînî) û Sên Abostîn(sedsala 5'an a Zayînî) bawerî bi teoriya han hebûn. Her çend ku teoriya piloralîzmê ji aliyê fîlesofên Ewropayî ve hatiye darêtin, lê pêşengên serxwebûna Amerîkayê û berhevkerên destûra Amerîkayê û fîlesofên Amerîkayî, zêdetir ji kesên din girîngî ji teoriya han re dane.

Di piloralîzmê de, girîngiyek zaf ji sazî û yekîtiyên taybetî re tê dayîn û alîgirên vê hizrê li hember maytêkirina dewletê di nava kar û barên civakî de, ber xwe didin.

Poloralîst berevajî Anarşîstan haşayê ji hebûna dewletê nakin, belku hebûna wê ji bo civakê bi girîng dizanin.

**Çavkanî: (Ferhengî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî**

**(Danêşnamêyê Siyasî) "Politicial Dictionary"**

**Daryûş Aşorî**

# Civak Nîviya Laşê Xwe Dişewitîne

**Selam Îsmaîlpûr**

Gellek caran em dibihîsin ku dibêjin "**jin nîviya civakê ne**", hevoka han di rastî de ne tenê rastiya civakî belku rênas û nîşanderê hêvî û armanca wekhevîxwazane a regezek jêrdest û mafxwaz e ku herçend pêkhênerê nîviya civaka mirovahiyê ye, lê xwediyê derbazbûyiyek dûr û dirêj ji koletî û tepeserkirina regezî ye ku regezê hember (nêr) bi ser de daye sepandin. Lewra em dikarin vê pirsê bikin gelo destkevtên jinan di jiyana civakî de çi ne? Bo mînak di Îrana îro de û nemaze di civaka Kurdewarî de pêgeha civakî a jinan di çi astekê de ye?

Bona bersivdana pirsa han ger em mêzeyî manşeta nûçeyên rojane û rûpelên belavokên welatê xwe bikin, xuya dibe ku jin di civakê de çiqas çareres e. Deb û edetên civakî û yasayên rejîma Komara Îslamî a Îranê du aliyên bihêz in bona ragirtina jinan di rewşa heyî a xirab de. Ger em mêzeyî enisîklopedyaya îroyîn a civaka Îranê derheq zirûfa jinan bikin, komek peyv dikevin ber çavên mirov ku bê tu nêrînekê rastiyên derbarê rewşa jinan ji me re rohn dibin. "Namûs" yek ji peyvên herî bigehîn û girîng ên pêkhênerê çawaniya mêzekirina civaka me ye derheq pirsa jinan. Jin di welatê me de demekê dibe xwedî pênase ku bibe namûsa kesekî yan kesanek ji regeza nêr. Anku bi xwe xwediyê tu nasnameyek cuda nîne. Lewra "namûs" yek ji mafên ne dadperwerane ye ku azadî û jiyan û kesayetiya jinê girê dide bi hez û xweziyên hevjînê wê yan bira, bav û heta gişt mêrên malbat û eşîrê. Heya dema ku jin seh bi kolebûna xwe neke sîstema han bê tu pirsgirêkekê dê kar û barên xwe birêve bibe. Lê pirsgirêk wira tê holê ku jin seh bi kolebûna xwe dike û dema ku ji mafê xwe tê digihîje, hewlê dide bona têkdana hevesngiya han a ne dadperwerane. Bê şik cehdên han tevî komek asteng û kospên bihêz berbirû dibe û civaka mêrserdest bona domandina mana xwe û ragirtina jinan weke koleyekê, rêya tepeserkirin û serkutkirina zêdetir digire pêş û bi armanca bêpakirina jinan ji destkevtên cîhana modern û mafê mirovan ji çeka namûsê mifahê distîne. Her weke di madeya 21 a cezayên Îslamî de hatiye: " Ger bav yan bapîr, zarok yan nevîyê/a xwe bikuje, tu tole lê nahê standin, tenê divêt heqê xwîna wî/ wê bide xwediyê wan. Yan di cihek din de her ev yasaye heta kuştina namûsî weke mafek ji bo mêr dihesibîne. Bo mînak **Firîşte**



**Necatî,** keça Kurd a li bajarê Merîwanê ku di havîna derbazbûyî de bi destê bavê xwe bi terzek hovane hate serjêkirin. Lê bavê wê bê tu cezadanekê ji aliyê dadgehê serbest hate berdan. Zext û givaşên han bo ser jinan di zirûfekê de ku ew seba guhertinên serdemê hêdî hêdî nasiyariyê tevî mafên xwe peyda dikin û digel rewşa xirab a xwe di civaka Kurdistanê de berhevdanê dikin, dibe sebebê serhildana hinek diyarde û djikiryarên tund û tûj ên weke xweşewitandin, helatin ji malê, xwefiroşî, ji hev veqetiyan û... di nava jinan de. Li gor serhejmariyan, welatê Îranê niha sêyemîn welatê cîhanê ye ku tê de xwekujiya jinan di halê xurtbûnê de ye û hêdî hêdî ji xwekujiya mêran zêdetir dibe. Hewce ye bê gotin ku di gişt welatên cîhanê de, ji her 4 kesan ku dest didin xwekujiyê, 3 kes mêr û yek ji wan jin in.

Karnasên vê warê nexweşiya xemokiyê weke sedema herî sereke a xwekujiya jinan dizanin. Lê karnas di hinek welatên cîhanê ên weke Îranê de, hebûna pirsgirêkên malbatî weke sedema herî bingehîn bona encamdana xwekujiyê dihesibînin.

Pêka serhejmariyan, di Îranê de Parêzgeha Îlamê zêdetirîn asta xwekujiya jinan bi xwe ve girtiye. Herwiha asta xwekujiya jinan di parêzgehên Yasûc, Kirmaşan, Îlam û Sine de pitir e ji nîviya hejmara hemû ew kesên ku di gişt Îranê de xwe dikujin.

Li gor lêkolînan, xweşewitandin yek ji berçavtirîn rêyên xwekujî di Îranê de ye. Derûnnas li ser vê bawerê ne ku xwekujiya han bi armanca diyarkirina hawara nerazîbûnek tepeserkirî pêk tê û berevajî metodên weke xwekujî ji rêya xwarina heb yan daliqandinê, ku bi terzek bêdeng tê encamdan. Xweşewitandin hawareke mezin e li dijî rewşa xirab û nebaş a civakê. Di heyama meha derbazbûyî de di parêzgeha Kirmaşanê de 4 jinên Kurd seba xweşewitandinê canê xwe ji dest dan. Di nava wan de hewce ye em îşare bi du keçên 16 salî bi navên **Seher Reûfî** û **Şeyda Muradî**, akinciyê bajarên Pawe û Ciwanroyê û **Seyran Rehîmî**, temen 24 salî û xelkê Selas û Bawecanî bikin. Seyran tenê yek heftî bû ku zewicî bû!! Herwiha Keçek li Kamyaranê seba hejariyê, jinek temen 50 salî li Urmiyê seba pirsgirêkên malbatî, keçek li Ciwanroyê bi navê **Fatime Ebasmeniş**, seba pirsgirîkên malbatî, du jin li Mehabad û Pîranşarê seba azar û îşkenceyan ji aliyê hevjînê xwe, dawî bi jiyana xwe anîn. Qurbaniya herî dawi jî, **Nazdar Behmenî** (27 salî) ya gundê Tazave ser bi bajarê Dîwandere bû ku ji ber pirsgirêkên malbatî xwe şewitand. Pêla han a berfireha ya xwekujî û xweşewitandina jinan vê pirsê tîne holê: Gelo civakek ku di pêxema parastina hinek nerîtên paremayî de nîviya pêkhata xwe ber bi mirin û xweşewitandinê dibe, çawa dê bikare seh bi kolebûna netewa xwe bike û bona derbazbûn ji rewş û zirûfa han a xirab ku neyaran bi ser de daye sepandin, pêngavan bavêje û xebatê bike?

www.arsivakurd.org

# Yek Kron Ji Bo Pêçana 10 Kîlo Şekrokan!



**Kavûs Ezîzî- Danîmark**: Girûpek jin li ser rêya ber deriyê mala xwe dirûnên û şekrokan di nava laylonê de dipêçin. Li bajarê Sîlîgûrî li Bakûurê Rojhilata Hindistanê, fabrîkayekî şekrokçêkirinê heye û ew jinên han hemû rojekê diçin wê fabrîkê û 10 kîlo ji van şîrnokan tînin û dipêçin, li hember vî karî tenê 1 Kron (1 Kronê Danîmarkê dike 195 Tûmenê Îranê û kêmtirî 20 Cent) weke heqdest werdigirin.

Eva ku me li jor nivîsî, kurtiya nûçeyeke Danîmarkî ye ku di Rojnameya 'Metro Express' a roja 07.01.2009'an hatiye çapkirin. Lê bila em bizanin ku çima wêneyê han û wê kurtenivîsê bala min kişand?

Ez li karxanyeke çêkirina derî û penceran de mijûlî kar im, sibezûyan demjmêr 7'ê hazir dibim ji bo destpêkirina şola xwe, rojname ji bo me hemûyan têne cihê me û di dema bêhnvedanê de em nûçeyên rojê dixwînin.

Li zarokiya xwe heta niha weke adeteke xasmanî yê min, hinek tişt pirr bala min dikêşînin, lewra dema min ew nûçe dît, 1 xet li jor û 2 xêz jî li jêr hatine nivîsîn, min xwendin, rast Duheftînameya Agirî kete bîra min.

Wêne ji aliyê Ajansa 'REUTERS'ê ve hatiye girtin.

Bila em bizanin balkêşbûna wêne û nûçeyê han di çi de ye?

- Feqîrî û xizaniya van mirovên han ku bi kêmtirî 20 Cent di rojê de hazir in kar bikin, heta bikaribin nanê roja xwe derxînin, balkêş e.

- Bê wijdaniya xwdiyên karxaneyê ji bo ku bi diraveke herî herî kêm karê xwe birêve bibin û bona ku hewcehî bi karkeran nebe, van mirovên birsî û belengaz diçewisînin. Şekrok bi awayekî ne saxlem û di nava toz û li ser telîs hatine rêtin, wan jinane çi lepikek di dest da nînin ku bêguman destê van paqij û saxlem nînin.

- Ev zaroka ku li ber şerkrokan raza ye, herwiha xîz û xoliya derdora cihê pêçana şîrnokan û li ber hewa û ser rêyê di warê tendurustiyê de ne durist e.

Ya ku li hemûyan giringtir û hewce ye bas bikim ev e ku ev şekokane, mixabin zarokên xizan dê bixon û xuya nake ku ka dê bi çi nexweşîyekê re rûbirû bibin!?

Heke xetayek wisa li fabrîkayekî Ewropa derkeve holê, bi xasma di xwarina zarokan de, ez bawer im ku dê bo hetanî heta wê karxaneyê daxin û karê wê qedexe bikin.

## Komara Îslamî Ji Bo Alîkarîkirina Hemasê, Miaşê Karmendan Kêm Dike



Rojên yekşem û duşem, 04-05.01.2009'an, Hesen Ebasî, Fermandarê Bokanê, fermanderê hêzên Întizamî, fermanderê Sipaha Bokanê û çend berpirsên din ên rejîmê, bi alîkariya Îdareya Ewlekarî ya Bokanê, di Fermandariya Bokanê de civiyan.

Armanca civîna han, kêmkirina miaşê karmendên dewletê, ji bo alîkarîkirina Hemasê bû.

Kêmkirina miaşê karmendan bi armanca alîkarîkirina Hemasê, ji aliyê Parêzgarê Urmiyê ve hate ragihandin û ew pereye ji miaşê mehane a karmendan dê bê kêmkirin.

## Kasibkarekî Bokanî Di Bin Îşkenceyê De Jiyana Xwe Ji Dest Da

Roja yekşem, 04.01.2009'an, kasibkarekî Kurd bi navê Haşim Remezanî, xelkê gundê Sarûqamîşan ser bi bajarê Bokanê, bi sedema îşkenceyên xurt ên cendekî ji aliyê Îdareya Agahî a Mehabadê ve jiyana xwe ji dest da. Haşim Remezanî ku xwediyê jin û zarokan e, 10 rojan berî vê ku bê kuştin, bi buxtana kasibiya qaçax, ji aliyê Îdareya Agahî ve hatibû binçavkirin. Navhatî serbarê vê yekê ku tu tawanek li ser wî nehate selimandin, kete ber îşkenceya Îdareya Agahiyê.

Hêjayî gotinê ye ku hewla malbata Haşim remezanî ji bo wergirtina termê wî heya niha bê encam maye û karbidestên rejîmê xwe ji dana termê Haşim diparêzin.

## Rojeva Civakê

### Rapora Wêneyî A "Washington Post"ê, Li Dor Sinetkirina Keçan Li Kurdistanê

**Agirî- Beşa Civakî**

Li gor rapora Jinên Azermêhr a Kurdistanê, rojnameya "Washington Post"ê, di raporekê de serbarê baskirina serpêhatiya çend keçên sinetkirî ên Kurd, di vê derbarê de çend wêne çap kiriye ku gorîbûna jin û keçên kurd ji rêya yasayên paremayî û bavserdestiyê ve dixe berçav.

Di herêma Kurdistana Îraqê de salane sedan keç tên sinetkirin û di hinek ji deverên Kurdistana Îranê de jî diyardeya han tê xuyakirin.

"Washington Post"ê, di vê derbarê de nivîsandiye: Berevajî wêneyên heyî, sinetkirin ne tenê tu qazancek ji bo tendurustiya keçan tuneye, belku dibe sebebê pêkhatina pirsgirêkên hundirîn ji wan re û kesên pispor ev yek îsbat kirine ku sinetkirina keçan, bandora nerênî li ser şiyana cinsî(seks) a jinan



didanê.

Sinetkirin diyardeyek e ku binc û rîşalek kûr di çand û baweriyan de heye û hêcetên weke kontrolkirina jinan birêve diçe.


Nûçegihanê "Washington Post"ê, Amît Bolî, çîroka zarokeke keç ku bûye goriya sinetkirinê bi vî awayî bas dike: Şîlan Enwer Omer, keçek temen 7 salî di rê û resmekê de beşdarî dike ku berê diya wê jê re bas kiribû, lê dema ku diçe bo rê û resma baskirî, dibîne ku tu deng û basek derheq rê û resmê nîne û ew hatiye lêbandin.

Ew li cihê çûn bo rê û resmê, bo mala jinek ku di taxê wan de bi Maman hatiye nasîn û keçan sinet dike. Dema ku Şîlan derî dixe, Maman(doktora taybet a jinan) deriyê sor yê jengbûyî vedike û hemû diçine nav malê.

Dema ku Şîlan dibîne diya wê kincên wê dixe, tirs wê da digire û dikeve lerzê, Maman weke kesek ku bixwaze mirîşkekê serjê bike, lingên Şîlanê digire û tîxekê tîne derê û dest bi kar dibe û ...

www.arsivakurd.org

# ZANYARÎ



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Ji hin hewldan û çalakiyên mirov ên bingehîn yek jê jî hilberîna zanyariyê ye. Ev hewldan jî hewldaneke gerdûnî ye. Digel vê hewldana gerdûnî ku xizmetê ji mirovahiyê re dike, armanceke wê ya pirr girîng û pîroz jî heye. Ew girîngî jî girîngiya ku jiyana mirov a rojane hêsan û geş dike ye. Ango zanyarî wekî pêkera(faktora)herî girîng a ku hevahengiya mirov a civakî û gerdûnî (dûr an jî nêzîk) pêk tîne, tê dîtin û pejirandin. Tiştê ku bi awayekî rastîn ji bo mirov rêber û rênasiyê dike zanyarî ye. Mirov dikare bi nêzîktêdaneke felsefî bibêje ku zanyarî, pencereya ronî û ronîdariyê ye. Bi vegotineke din zanyarî, ezmûn û ceribandina ku di encama doman an jî merhaleyeke girîng de derdikeve holê ye. Ango zanyarî, piştî radeyeke bilind bi dest dikeve an pêk tê. Li gorî rêbaz û qaydeyên zanyariyê ev merheleya girîng jî wekî "azîneya zanistê" tê binavkirin.

Îcar tiştê ku pêwendiya navbera tişt (heyber) û kirûyê diyar dike azîneya zanistê ye. Her wiha tiştê ku zanenbûna rastîn û zanistî ji hin zanebûnên kinemine, kerambera û eletewş vediqetîne jî ev azîne ye. Divê baş bête zanîn ku zanyariya hîmdar û ewledar di her dem û domanên dîrokî de wekî pêdiveyke bivênevê hatiye dîtin. Ji lewre hemû zanyarî û agahî pêşî li ser hîmê vê zanyariyê (an jî vê azîneyê) ava dibin û wekî mîrateyeke qedîm ji bo siberoja mirovahiyê tên parastin û veguhastin. Bo nimûne zanyariya çandiniyê di serî de bi lêgerîn, lêkolîn û dahûrandinên li ser nifşên riwekan (nebat û giyayan) dest pê kiriye. Û piştre girêdana mirov a bi ax û erdnîgariyê bûye sedema avakirina gund û bajaran û peyre jî pêkanîna çanda avahîsaziyên nûjen.

Armanca zanyariyê ya herî girîng, pêkanîn û bidestxistina zanyariyeke ewledar e.

Îcar gelo hemû hewldan û xebatên ku bi vê mebest û armancê dest pê dikin digihîjin encamekê an na? Bi rastî gellek hewldanên zanistî li nîvê rê ji armanc û mexseda xwe bidûr dikevin û dikevin xizmet û suxreya kes û hêzên desthilatdar û di eleniya mirovahiyê de tên xebitandin. Zanyariya ku tê peyitandin/çespandin wekî berê zanistê tê pejirandin.

Digel gellek birrên zanyariyê yên cure bi cure du birrên wê yên bingehîn hene. Yek zanyariya serobero (çawalêhato û kerambera) û ya din jî zanyariya zanistî ye.

Di zanyariya serobero de, hewcetî bi çespandin û peyitandina rastî an jî şaşiyê namîne.

Lewre mirov wê zanînê bi sehekiyên xwe fêr dibe an dihisîne. Ev zanyarî wekî zanyariya bêpergal tê binavkirin. Belê ev zanyarî hem jiyana mirovan a rojane hêsantir dike û hem jî sûdeke mezin dide pêwendî û danûstandinên mirovan ên civakî. Bo nimûne, bîr û baweriyên olî, lîstik û hengameyên civakî, kevneşopî, çîrok û çîvanokên devkî û hwd.

Hemû bi saya vê zanyariyê bi dest dikevin. Ji bo bidestxistina vê zanyariyê jî hewcetî zêde bi tu kar û xebatên taybet nîn e. Di karê rojane de ango bi domahiya jiyanê re jixweber pêk tê û bi dest dikeve. Belê zanyariya zanistî ne wisa ye. Ji bo bidestxistina zanyariya zanistî hewcetî bi çespandin û selmandineke xurt a şaşî an jî rastiyê heye.

Di zanyariya zanistî de bêyî azîneya zanistî tu tişt nayê çespandin. Bûyer û kirûyên heyî li gorî vê azîneyê tên nirxandin û formulekirin. Taybetiyên zanyariya zanistî hin jê ev in:

1. Zanyariya zanistî tişteyî ye(ojektîf û bêlayan e): Agahî û encamên ku bi zanyariya zanistî re der dibin li her devera dinê heman in û li gorî kesan nayên guhertin. Bo nimûne kêşana erdê ya ku bi ji hêla Newton ve hatiye çespandin ji hêla hemû mirovan ve tê pejirandin.

2. Zanyariya zanistî misoger e: Ji bilî rêbaza kirû an jî bûyera ku rastiya wê hatiye çespandin tu agahiyên din wekî rastiyê nayên pejirandin.
Kî ji cem xwe de rastiyeke din angaşt bike jî, heta ku rastiya berê neyê pûçkirin, ew wekî rastiyê nayê pejirandin.

3. Zanyariya zanistî rasterast bi azîneya ceribandinê ve girêdayî ye: Agahiya ku xwe nespêre ceribandinê wekî zanyariyên zanistî nayên pejirandin.

4. Di bingeha zanyariya zanistî de pêşbînî û dûrendîşî/besîret) heye: Gumankirina encama bûyerekê bi ceribandinên berê bi dest dikevin.
Mirov dikare ji bo vê azîneyê kelandina avê an jî meyandina mast wekî mînak nîşan bide


5. Zanyariya zanistî giştî ye: Bo nimûne, daxuyaniyên der barê tiştên tîr, ron, don û gaz li gorî vê azîneyên tên senifandin.

Digel ku hewcetiya mirov bi zanyariya serobera hebe jî, tu tişt bêyî zanyariya zanistî pêk nayê û bi encam nabe. Heke bibe jî ne zanistî ye û nayê pejirandin.

*Kaniya Helbestan*

# Dîwar

**Jîla Husênî**



Çima te helbestên min
nexwendin
Min bo te helbestên
herî aşiqane gotin
Himbêza gotinên
xwe yî herî germ
min bo te vegirt
Ew dema min xwest
behsa te bikim
min rûpelên ferhenga gotinan
di ramanên xwe de wergerandin
û ciwantirîn gotinên resen
rêz bûn li pêş fermana min
û min
çiya, rastî û roj
bo pesnê te hilbijartin
Te tu caran
helbestên min nexwendin
û rûnenişt di himbêza
gotinên min de
tu li min tênegihişt
Mabêna min û te dîwarek e
bi tundiyê baweriyek e
lê belê heyhat
û sed mixabin
ku te raza gula lavlavê nezanî
û hest bi daxwaza wê nekir
bo têgihiştina hembêzek germ
û mişt bawer
Û te helbestên min nexwend
û hest bi min nekir.

www.arsivakurdi.org

**Linguicide An Jî Zimankujî**

# Geriyanek Di Dîroka Fransayê De Li Ser Yekîtiya Zimên Û Yekîtiya Neteweyî

**Beşa 2**



**Îbrahîm Seydo Aydogan**

**Zimanên ku wê demê li ser axa Fransayê hebûn**

Wê demê li ser axa Fransayê ji 600'î zêdetir zaravayên zimanê romayî hebûn û bi tenê kesên ku bi xwendin û nivîsandinê dizanîn, latînî bi kar dianîn.

Ev hemû zarave û devokên zimanê romanî bi sê grûpan ve têne şayesandin ku em di nexşeya kêlekê de jî dibînin.

Zimanên Oyl (oïl), zimanên ok (oc) û zimanên franko-herêmî (franco-provençal). Binavkirina van zimanan li gora peyva « erê » hatiye kirin. Li başûrê Fransayê ji bo ku bibêjin « erê » digotin « oc », li bakur jî digotin « oyl » û « oui »ya îro ji bakûriyan hatiye.

Zimanê desthilatdariyê ku jê re Franciqî an jî Fransewî dihat gotin, yek ji van zimanên « oyl » e an jî yek ji zaravayên zimanê "gallo-romanî" ye. Lê belê ew zimanê ku bi tenê li herêma Parîsê dihat axavtin, ji aliyê % 99ê xelkê ve nedihat zanîn û di serî de tu bandora wê tunebû.

Gava ku "Hugues Capet" bû paşayê Fransayê, di dîroka zimanê fransî de gaveke din hate avêtin.

Lewre, Hugues Capetê ku di sala 987'an de bû sultan, bi tenê bi zimanê xelkê, yanî bi Fransiya kevn dipeyivî.


Ji ber ku Hugues Capet mîna sultanên berî xwe paytexta xwe li bajaran nedigerand û bi tenê li Parîsê bi cih bû, desthilatdariya wî jî hêdî hêdî xurtir dibû. Ji ber ku Parîs paytext bû, arîstokrasiyê bi awayekî xwezayî zaravaya sultên bi kar dianî, lê Parîs ew dever e ku gellek bazirgan jî tê re derbas dibûn û paytext herweha dibû cihê ku çand û zimanên cuda jê li hev rast dihatin. Vê yekê kir ku Parîsî jî ji xelkê din bipêşdetir bikevin û kesên ku ji derve dihatin jî fêrî zimanê wan bibûna. Bivê nevê, zimanê sultên bû û ji bo hemû karên fermî û destûran diviya bi wî zimanî bihataya axavtin.

Desthilatdariya "Hugues Capet", weke bingehê Fransayê îro jî dikare bê hesibandin, lê belê navê Fransayê cara yekem di sala 1119'an de hate bikaranîn.




"Louisê" 6'emîn ku sultanê wê demê bû di nameyeke xwe de ku ji papa Calikstê II re şandiye, dibêje ku ew sultanê Fransayê ye û êdî ji xwe re nabêje Frankî û ew girêdayî dêra romayî ye. Wê demê ji zimanê wan re digotin « Fransewî ».

Ji ber ku paytext qet neguherî, arîstokrasiyê, bi dû re jî hiqûqê û dêrê jî ev ziman bi kar anî û Fransiya herêma Parîsê hêdî hêdî bandora xwe li ser zaravayên din yên bakûrî kir û di sedsala 13'an de êdî zaravayên başûrî jî dabû ber xwe. Di sala 1290'an de gramerek ji bo fêrbûyina Fransî jî hate amadekirin ku armanca wê ew bû ku kesên biyanî bikarin fêrî Fransî bibin. Di nêviya sedsala 15'an de êdî herêmên Başûrî yên okaxêv jî di peywendiyên xwe yên bi sultên re Fransiya wî bi kar dianî û pirraniya wan êdî li kêleka zimanê xwe, bi fransîya Parîsê jî dizanîn. Bê guman, bikaranîna çapxaneyê, zimanê nivîskî û wêjeyî û perwerdehiyê û dêrê jî di belavbûna





Fransiya Parîsê de bandora xwe kir. Lê dîsa jî yekîtiya zimanî têkelbûyîna desthilatdaran pêwîst dikir. Fransî di kirinê de bibû zimanê fermî û xelkê ew weke zimanê hevpar bi kar dianî. Bivê nevê, yekîtiya zimanê fermî dê bandora xwe li ser ziman û zaravayên din jî bikiraya û ew bi temamî di herêmên piçûk de asê bikirana.

## Ziman tên qedexekirin

Di sala 1539'an de François 1 (Fransûwa tê xwendin) fermanek 192 xalî da ku dîrok îro jî bi tenê behsa du xalên wê fermanê yên giring dike. Di xala 110'ê de ferman tê dayin ku heçî zagon û fermanên birêvebiriyê bi zimanekî zelal werin nivîsandin ku kesek çewt tê negihîje û di xala 111'an de jî tê gotin ku heçî karên fermî bi zimanê Fransî werin kirin û qeydkirina wan jî dîsa bi wî zimanî were kirin û di van karan de tu zimanên din neyê bikaranîn. Ji ber ku zimanê xelkê ji berê de li dêrê serbest bû û heta wî çaxî zimanê Latînî û Fransî di karên fermî de bi hev re dihatin bikaranîn, ev ferman bi tenê dikare li dijî zimanê Latînî were nirxandin.

Heta sedsala 17'an jî Fransî hêdî hêdî li herêman belav dibû û li her deverekê bi awayekî cuda an tev li zimanê din dibû an jî diket şûna wî. Ji ber ku sîstemên desthilatdariya berê ne weke ya îro bûn, bicihkirina zimanê fermî û pejirandina wî ya ji hêla xelkê ve heta şoreşa Fransî jî dewam kir.

Di sala 1635'an de "Richelieu"yê wezîrê Fransayê xwast êdî bi awayekî dezgehî dest biavêje mijara yekîtiya zimên û ji bo





çavdêrî û parastina zimanê Fransî Akademiya Fransî ava kir. Wê demê "Jean Racinê" şanonivîs, bi xwe jî di behsa sefereke xwe ya 1661'an de, gazindan dike ku xelkê herêmên din ji fransiya wî fêm nakin û ew tiştekî dixwaze û xelk tiştekî din ji wî re tînin. "Racine" dibêje ku wî di wê sefera xwe de nedîtiye ku ne qeşeyek û ne jî mamosteyekî dibistanê bi Fransî bipeyive. Hêjayî gotinê ye ku wê demê perwerdehî li ser bingehên olî bû û bi pirranî bi zimanê herêmî, carnan jî bi Latînî dihat dayîn.

Lê dîsa jî divê mirov balê bikişîne ser ku Fransiya akademîk berî avakirina Akademiya Fransî li Birîtanyayê bi pêş ketiye. Lewre, sultanên Brîtanî bi eslê xwe Fransî bûn û zimanê wan zimanê desthilatdariyê û bazirganiyê û perwerdehiyê bû. Yekem gramera Fransî jî li Birîtanyayê hatiye nivîsandin. Lê Brîtaniyan piştî şerrê sedsala 14 û 15'an ku bi Fransiyan re hat kirin, êdî dev ji Fransî berdan.

Heta şoreşa Fransî ya 1789'an jî rewşa Fransî li Fransayê ev bû û li gora "Albert Dauzat" yê pisporê zaravayan, di sedsala 17'an de 636 zarava û devok hebûn. Fransiyan wê demê ji hemû zimanên cuda re digotin zarave û devok û peyva « patois » (patûwa tê xwendin) ji bo binavkirina wan bi kar dianîn ku ev peyv bi tenê ji bo « devokan » û cudahiyên herêmî tê bikaranîn. Dîsa jî, ji ber kêmbûna peywendiya di nava herêman de û ji ber ku gellek kesan mîna "Racine" gazindên xwe kirine, mirov dizane ku ji bilî herêma Parîsê û derdora wê, kêm kesan bi zaravayê Parîsê dizanî. Ji ber wê, akademiyê û "Vaugelasê grameryen" xwast axavtina Fransiya xweş û rast ku bi Fransî jê re dibêjin « le bon usage » di nava xelkê de belav bikin. Di sala 1694'an de ferhenga Akademiyê ya yekem hate çapkirin ku tê de peyv hatin dabeşkirin, lê belê peyvên wê ferhengê bi tenê ew peyv bûn ku li gora wan ji aliyê kesên têgihiştî û biedeb ve dihatin bikaranîn û cihê hemû peyvan tê de nebû. Lê belê, mirov nikare zimanê xelkê bi hêsanî biguherîne. Ev Fransiya akademiyê jî bêtir di nivîsandinan de û di nava axavtina arîstokrasiyê de ma. Hayê xelkê ji wî zimanê û nûkirina wî nebû. Xelk dîsa bi devok û zaravayên xwe dipeyivî heta ku desthilatdariyê siyaseta xwe tundttir kir.

**Dûmahîk heye...**

# Sî Sal Bi Ser Koçkirina Mîr Dr. Kamîran Alî Bedirxan Re



**Konê Reş**

Berî 30 salan di rojek mîna îro de (4-12-2008) Mîr Dr. Kamîran Elî Bedirxan li Parîsê Koça dawî kir. Bi koçkirina wî re stêrek geş û bi ronahî di asmanê welatê me de hat rijandin.

Belê tevî ku ji 30 salî ve koç kiriye lê, degvedana navê wî, hêza hunera wî, pîş û sazên wî di nav gel de hatine çandin, xweş ber dane û bi saya wî, roja îro, gellek stêrkên çirsî di asmanê Kurdistanê de dilîzin…

Bi vê mebestê kêfxweş dibim wek wefadarî di vê panorama kurt de, wî bibîr bînim.

Dr. Kamîran Bedirxan; neviyê Mîrê Cizîra Botan, mîr Bedirxan e:1802-1868, yê ku di sala 1843'an de, di herêma Botan de mîrnişiyek ava kir, peyre bi navê xwe deranîn û di mîrnişiya xwe de belav kir û got: **Dîn dînê Xwedê ye, em tev birayên hev in**…û biyaniyan di pesna wî de gotin: **Bedirxan Edalet e û edalet Bedirxan e**…

Û kurê Emîn Elî Bedirxan e (1851-1926). Yê ku ji kesên pêşîn bû komeleyên kurdî li Stenbolê damezirandine ji bo mafê gelê kurd... Mîr Kamîran di roja(21'ê Tebaxa 1895)an de li Stenbolê çêbûye, xwendina xwe li Stenbolê qedandiye.. Di 17 saliya xwe de beşdarî di şerê Beqanê de kiriye.. di sala 1919'an de bi birayê xwe mîr Celadet Bedirxan, Ekremê Cemîl Paş , Hac Tewfîq( Pîremerd) û Mêcer Newêl yê Înglîzî re li Kurdistanê geryane, ji bo daxwazên gelê Kurd û çareseriya pirsa kurd, berî ku peymana Sîverê bê mohirkirin…Ji ancamên wê gerê, ev her sê bend ji bo Kurdan hatin dan; 62-63-64.. Piştî ku Mustefa Kemal di sala 1923'an de derbasî Stenbolê bûye, hingî wî fermana Bedirxaniyan û tev welatparêzên kurdan deranî.. Vêca ji neçarî Mîr Kamîran digel birayê xwe Mîr Celadet, xwe li Almaniya girtine, bavê wan digel birayê wan ê mezin Sûreya xwe li Misrê, bajarê Qahîre girtine… û wiha Kamîran xwendina xwe li Almaniya biriye serî… Di sala 1927'an de vegeryaye Rojhilata Navîn û digel birayê Mîr Celadet beşdarî di avakirina komela Xoybûnê de kiriye… Di sala 1943'an de kovarek bi navê **Roja Nû** û rojnameyek bi navê **Stêr** li Beyrûtê weşandine.. Herdu jî bi kurdiya latînî bûn, digel beşekî biçûk bi fransîzî..

Di sala 1947'an de Beyrût li paş xwe hiştiye û çûye Parîsê, wek mamoste xebat di zanîngeha Sorbûnê de kiriye, beşê zimanên rojhilatê...

Buhiştî bi gellek zimanan dizanî bû, gellek pirtûkên wî li dor pirsa gelê kurd hene…

Ew di roja (4-12-1978)de li Parîsê çûye ber dilovaniya Xwedê.

Bi vê helkeftinê ez vî hebesta Omerê Xeyam ku wî ji Farsî wergerandiye zimanê Kurdî diyarî canî wî dikim:

Ji hatin û çûna me, kar çiye
Berê hêviya jîna me, li ku ye
Di çerxa jînê de, çend mirovên pak
Şewitîn û ax bûn, ma dû li li ku ye..

Û vê helbesta wî (**Koçera Mîran!**), diyarî xwendevanên zimanê kurdî dikim:

Ho koçera min!
Min bi maça devê xwe
Maç bike.
Hevîna te
ji şerabê spehîtir e.
Bihna te
bihneke şêrîn e.
Dengê navê te
wek roniya rojê belav bûye,
ji lewre herkes hej te,
hej sura bayê te dike...
Di nav kûlîlkên sor û zer de
kûlîlka spehîtir tu î.
Di nav jinên zirav û şîrîn û bi bejn û bal de
a çelengtir tu î...
Koçera min
rabe û min bi maça xwe
maç bike.
Dilê min
serxweşiya maça te
mestiya bêhna te dixwaze.
Berde, bila zenda min bibe
kemberbestiya nêvtenga te.
Dev û lêvê te
kaniya ramûsanê ye,
bihêle bila bêriya dilê min,
bi ava wê kaniyê dîn û bêhiş
bikeve!
Ho koçera min..

# Tevehodî Kî Ye?

**Kurdo Agirî**

Li Îranê bi taybet li Xorasanê, dema ku navê Kelîmolah Tevehodî (Kanîmal) tê ser zimên, her kes zû peyv û goteyên kurd, kurmanc tîne bîra xwe.

Ev bîranîna jî bê cih nîne. Kanîmal kurdê Kurmanc ê Xorasanê ye. Ew di sala (......) li gundê Oxaz ser bajarê (.......) ji dayîk bûye. Piştî bidawîanîna xwendina lîseyê, bûye endamê hêza polîs, lê piştî demekê dev ji wî karî berda. Kanîmal biryar da ku nehêle ziman û çand, dîrok û rê û toreyên kurdên Xorasanê bi awayekî devkî bimîne û ji bîr biçe. Wekî em dizanin gellek tiştên li ser kurdan nehatin nivîsandin û mixabin îro jî haya kesî ji pê tune ye. Kanîmal li hember her asteng û pirsgirêkên aborî, ewleyî, rawesta û xizmet bo çanda ji xwe re kir armancek mezin. Ew bajar bi bajar, gund bi gund, him suwarî him jî peya geriya. Tu caran newestiya. Bi îradeya xwe ya bêhempa kurdên Xorasanê da nasandin.

Berî Kanîmal gellek kes li Xorasanê hebûn ku li ser kurdên wê deverê gellek tişt dizanîbûn û bi koçkirina xwe her tişt jî bi xwe re birin. Lê Kanîmal her tişt nivîsî û hîn jî dinivîsîne.

'Stephan Blamo', mamosteyê muzîkê li zanîngeha 'New York'ê ku bi salan li ser muzîka kurdên Xorasanê kar kiriye. Dema ku tê Îranê yekrast diçe mala Kanîmal û di destpêkê de dîwarê mala wî maç dike û bi vî awayî dixwaze rêzdariya xwe ji bo xizmetên Kanîmal nîşan bide.



Kelîmolah Tevehodî

Ew zêde dike: "Eger Neteweyên Yekbûyî sed kes jî bikira berpirsên karên ku te kirine, dîsan jî nikarîbûn anegorî te pêk bînin." Kanîmal gellek pirtûk û nivîsar li ser kurdên Xorasanê weşandine an jî amade kirine ku dê bên weşandin.

Wek mînak mirov dikare yên jêrîn bi nav bike.

1- Koça dîrokî ya kurdan bo Xorasanê ( Farisî ye û ji heft cildan pêk tê)
2- Esferayîn, bajarê kurdan; doh û îro (bi farisî)
3- Dara Çildestan an Efsaneyên kurdên Xorasanê (bi kurdî)
4- Stranên kurmancên Xorasanê
5- Ferhenga kurdî ya Kurmancî
6- Rêzimana kurdî ya Kurmancî
7- Gotinên pêşiyan yên kurdên Xorasanê û gellek pirtûk û nivîsarên din…

Lê pirtûka herî hêja ku di vê dawiyê de weşandiye, dîwana Cefer Qulî Zengêlî ye. Cefer Qulî helbestvanê bi nav û deng ê kurmac li Xorasanê bûye ku nêzîkî du sed sal berê jiyaye, lê helbestên wî bi devkî û sîng bi sing yan li ser nusxeyên cuda gihîştine îro.

Kanîmal ji bo cara yekem gund bi gund, bajar bi bajar geriyaye, helbestên wî yên devkî û nivîskî kom kirine û li rûyê çil û çar nusxeyên di gundan da mayî, helbestên Cefer Qulî vejandine û wek dîwana Cefer Qulî di Weşanxaneya Vasî de çap kiriye.

Kanîmal ev helbest ji mirinê rizgar kir. Divê bê gotin, helbestên Cefer Qulî eger ji yên Ehmedê Xanî ra wekhev jî nebin, bêguman kêmtir nînin. Piştî çapbûna Dîwanê, şadiyeka bêhempa di nav kurdên Xorasanê da çêbû. Gellek kesan bi awayên cur be cur ji Kanîmal re sipasiyên xwe kirin.

Wek mînak xwendevanek ji wî re wiha dinivîse: Pismamê Kelîmolah, ew zehmet pirr dikşîne, bo xelkê kurmancan, ew kitêban diweşîne, zindî kiriye kurmancan, armanc bi dil nemîne, xeyal dikî ku ew Cefer Qulî ye ku bi bîr tîne.

Kanîmal niha li bajarê Meşedê dijî û notila berê dîsan bê westiyan lêkolînên xwe didomîne.

www.arsivakurd.org

agiri

**Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@gmail.com**



## Kovareke Nû Ya Zanistî Bi Îngilîzî Li Ser Pirsa Kurd Li Îranê derket




Yekemîn kovara zanistî ya taybet li ser pirsa Kurd li Îranê, di bin navê "Kurdish Issue In Iran" bi zimanê Îngilîzî hate weşandin. Yek ji endamên Desteya weşana Kovara han di hevpeyvîneke de eşkere kir ku kovara "Pirsa Kurd li Îranê", ji aliyê Navenda Qasimlo ji bo lêkolîn û pêşdeçûna siyasî hatiye belavkirin. Kovar ji çend mijarên giring û balkêş li ser pirsa Kurd li Îranê, sîstema siyasî a Îranê, doza Kurd û zimanê Kurdî di yasayên Komara Îslamî a Îranê de pêk hatiye. Kovara han bi rêveberiya Mecîd Heqê û Şerîf Bêhruz derdikeve. Di hejmara nû de Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Dr. Husên Tahirî, Mecîd Heqî û Dr. Elî Kiliç gotar nivîsîne. Hejmara nû ya kovarê ji 47 rûpela pêk tê. Navnîşana têkilî bi rêveberên kovara "Kurdish Issue In Iran" re:

**kurdishissue.iran@gmail.com**

Hêjayî gotinê ye ku birêveberên kovara han li ser xebat ji bo pitir nasandina pirsa Kurd bi xelkê biyanî, tekezê dikin.

## 2 Sînemayên Bajarê Kirmaşanê Hatin Daxistin



Li gor nûçeya Ajansa "ISNA"yê, Ebas Serwerî, Serokê Hewzeya Hunerî a Kirmaşanê ragihandiye ku derê du sînemayên Kirmaşanê bi navên 'Azadî' û 'Pîrozî' hatin girêdan.

Wî ragihand ku li bajarê Kirmaşanê du sînemayên 'Azadî' û "Pîrozî" çalak bûn, lê bi sedema xirabiya rewşa aborî hatin daxistin.

Ebas Serwerî got: birêvebirina sînemayan gellek dijwar bûye û birêveberên sînemayan ji ber nebûna pere û xirabbûna rewşa aborî êdî nikarin karê salonên sînemeyan weke dana miaşê karmendan û hin karên din, birêve bibin.

Serwerî her wiha got ku take sînemayek ku niha di bajarê Kirmaşanê de çalak e, sînemaya "Ferheng" e ku ew jî karên din weke werziş, tiyatro, sîrk û hwd... tê de birêve diçe.

Ebas Serwerî di beşeke din a axavtinên xwe de got: Bi daxistina sînemayan li Kirmaşanê, karesateke kultûrî bi dûve ye û nabe rê bihê dan ku tiştek wiha biqewime. Navhatî derheq xirabbûna rewşa salonên sînemayan li Kirmaşanê û hogiriya xelkê vî bajarî ji sînemayê re got divê sînema ji nû ve bên avakirin û çareseriyek ji wê pirsgirêkê re bê peydakirin.

Navhatî di dawiyê de daxwaz kir ku berpirsên organên ferhengî(çandî) girîngiyekî zêdetir bidin salonên sînemayan.

## Mistefa Cuma, Cîgirê Sekreterê Partiya Azadî Ya Kurd Li Suriyê Hate Girtin



Li gor daxuyaniyeke Partiya Azadiya Kurd li Sûriyê ku hebek ji wê ketiye destê 'Agirî', Mistefa Cuma (60 salî), Cîgirê Sekreterê Giştî yê Partiya Azadiya Kurd li Sûriyê hatiye girtin. Daxuyaniya partiya han diyar dike; piştî ku Mistefa Cuma roja 06.01.2009'an ji bo lêpirsînê bo navenda Muxaberatên Eskerî li Helebê tê vexwendin, heta niha li wê derê ji aliyê hêzên ewlekariyê ve hatiye binçavkirin.

## 2000 Kes Ji Xwendekar, Xebatkarên Mafê Jinan Û Çalakên Sivîl Nerazîbûna Xwe Li Ser Rewşa Xirab Ya Zeyneb Bayezîdî Diyar Kirin



Du hezar kes ji Xwendekarên Zanîngehan, Parêzerên Mafê Wekhev û Çalakên Civaka Sivîl bi belavkirina daxuyaniyekê nerazîbûna xwe li hember rewşa çalaka mafê jinan, **Zeyneb Bayezîdî** diyar kirin û piştgirî dan parêzerê wê jina girtî a Kurd ku dosyaya wê û cezayê sepandî bi ser Zeynebê bikeve ber pêdeçûnê. Zeyneb Bayezîdî 6 med dibe ku li bajarê Mehabadê ji aliyê hêzên Ewlekariya Komara Îslamî hatiye girtin û 4 sal ceza jê re hatiye birrîn. Zeyneb çalakeke mafê jinan li Kurdistanê ye ku hatiye girtin, lê rayedarên Komara Îslamî Zeyneb bi tawana xebat li dijî tenahiya neteweyî û alîgirî ji partiyeke siyasî ya Kurd a Opozîsyonê ceza kirine. Ew buxtane bi gellek çalakên mafê mirovan, civaka sivîl û xebatkarên mafên jinan tê dan.

Her 2000 kesên han daxuyanî wajo kirine.

## Otombîl Jî Dikarin Bifirin



'BBC'yê nûçeyek belav kir ku têra xwe balkêş e. Endazyarên NASA'yê otombîlek çê kirine, ku weke balafiran dikare bifire. Ev afirandina nû dê meha tê dê bihê ceribandin. Buhaya wê otombîla ku dikare bifire, 132 hezar Pond e. Heke ceribîna wê otombîlê serkevtî be, dê di pêşengehan de were nîşandan û dikare tirafîk û qerebalixa rê û cadeyan, nemaze di nava bajarn de, kêm bike.

www.arsivakurdi.org